# Bultena heftane

# 15/4/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

# Nûçeyên ji Cîhanê

## 16'ê Nîsana 2018'an: Ji 163 rêxistinên jinan danezana hevpar

Li dijî pêşnûmeya zagona înfazê ya têkildarî îstismara zayendî ya li ser zarokan a ew ê li meclîsê derbarê wê de hevdîtin bihata kirin 163 rêxistinên jinan di 16'ê Nîsana 2018'an de bertek nîşan dan û danezana hevpar a bi serenavê "Em ji pêşnûmeya zagona înfazê ya tundiya mêr ji nedîtîve tê îtiraz dikin "parve kirin.
http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/208946

Çavkanî:JINNEWS




## Neteweyên Yekbûyî: Ji zêdebûna nifûsê zêdetir bala xwe bidin mafên jinan

Neteweyên Yekbûyî bang li hikûmetan kir ku li şûna fikara ji ber nifûsa cîhanê ku 8 milyar derbas kitiye, rêzê nîşanî mafên jinan bidin.

https://anfkurdi.com/jin/neteweyen-yekbuyi-ji-zedebuna-nifuse-zedetir-bala-xwe-bidin-mafen-jinan-168845

Çavkanî:ANF



# Rojhilata Navîn

## Li lojmana polîsan jinek hat qetilkirin

Jina ku li lojmana polîsan a Manîsayê bi awayekî bi çekê hatiyê gulebarankirin hat dîtin jiyana xwe ji dest da.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-lojmana-polisan-jinek-hat-qetilkirin-38397

Çavkanî:JÎNHA



## Jinên Efganî: Em nikarin bêhnê bigrin

Li Efganistanê her sibeh dema ku jin ji mala xwe derdikevin rastî gefên Talîbanê tên. Gulbîxem Xefar jî yek ji wan jinan e dema ji mala xwe derdikeve ji bo ku pariyek nan peyda bike dizane dê rastî çi were.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-efgani-em-nikarin-behne-bigrin-38405?page=1

Çavkanî:JINHA



# [Mirinên bi guman ên jinan: Dosya ya nayên vekirin an jî tên girtin](http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/208950)

NAVENDA NÛÇEYAN - Di 21 sal desthilatdariya AKP’ê de yek ji mirinên bi guman ên serê wê hat girtin ya Yeldana Kaharman bû. Yeldana ku bi parlamenterê AKP’ê Tolga Agar re roportaj kir û rojek şûnde bi guman jiyana xwe ji dest da, encama otopsiya wê du sal şûnde derket holê û dosya dîsa jî nehat vekirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/208950

Çavkanî:JINNEWS




## [Li Îranê zext û zordariya li jinê giran dibe](https://anfkurdi.com/jin/li-Irane-zext-u-zordariya-li-jine-giran-dibe-168729)

Polîsên Îranê ji bo jinên ku qanûna nixumandina serî binpê dikin tespît bikin û ceza bikin, dest bi bikaranîna teknolojiya serdema dawî kir.

https://anfkurdi.com/jin/li-Irane-zext-u-zordariya-li-jine-giran-dibe-168729

Çavkanî:ANF



## Li Îranê sepanên ferzkirina hîcabê ket meriyete

Hikumeta Îranê ragihandibû ku wê bi kamerayan 'hîcaba bi zorê' kontrol bikin. Ev pêkanîn ket meriyetê.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-sepanen-ferzkirina-hicabe-ket-meriyete-38420

Çavkanî:JINHA



## Jinên kedkar ên xwedî zarok bi astengiyan re rûbirû dimînin

Zimanzan û wergêr Sara Serhan û endama Muanes Salêm Şeyma Deheb bal kişandin ser zehmetiyên ku dayikên kedkar li kargehan dijîn û diyar kirin ku însiyatîfa femînîst ji bo mafên dayikên kedkar roleke mezin dilîzin.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/jinen-kedkar-en-xwedi-zarok-bi-astengiyan-re-rubiru-diminin-38415

Çavkanî:JINHA



# Înfaza 30 salan a girtiyekê hat şewitandin

ALANYA - Înfaza Hatîce Çakmak a 30 salan ku li Girtîgeha Jinan a Tîpa L a Alanyayê tê girtin, hat şewitandin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/208965

Çavkanî:JINNEWS



# Cihê bûyerê mala parlamenterê AKP'yî ye

NAVENDA NÛÇEYA- Dosya Nadîra Kadîrova 3 sale li DDB'ê tê sekinandin û gumanbarê sereke yê parlamenterê AKP'î Şîrîn Unal ji bo dema nû namzet nehat nîşandan. Bal li ser biryara DDB û darizandina Şîrîn Unal e.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/209007

Çavkanî:JINNEWS



## [Li Afganistanê rewşa jinên esnafên biçûk her ku diçe xirab dibe](https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/li-afganistane-rewsa-jinen-esnafen-bicuk-her-ku-dice-xirab-dibe-38429)

Li Afganistanê rewşa jinan di qada aborî de her ku diçe xirab dibe. Jinên ku esnafên biçûk in, rûxmê zext û qedexeyên Talîban hemû firsendan bikar tînin û hewil didin xwe finanse bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/ked-u-abori/li-afganistane-rewsa-jinen-esnafen-bicuk-her-ku-dice-xirab-dibe-38429

Çavkanî:JINHA



## ʻDivê em rojnamegeriya ku jin tê de kirde ne pêş bixinʼ

Rojnameger Sûad Ebû Xetla diyar kir ku medya rolên zayendî pêş dixe û bal kişand ser girîngiya pêşxistina rojnamegeriya ku jin tê de kirde ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/dive-em-rojnamegeriya-ku-jin-te-de-kirde-ne-pes-bixin-38426

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê jin bi beşdarbûna qada siyasî bibin xwedî gotin’

Parlamentera Iraqî Nûr Nafeh, diyar kir ku jin bi hişmendiya "Şoreşa Cotmeha 2019'an" li welat ava kir re, zêdetir berê xwe dide qada siyasî û wiha got: "Divê jinên Iraqî bêhtir beşdarî qada siyasî û xwedî gotin bin."

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/dive-jin-bi-besdarbuna-qada-siyasi-bibin-xwedi-gotin-38431

Çavkanî:JINHA



## Jînên Îranê li dijî qedexeya hîcaba bi zorê meydanê dixwînin

Li Tahranê jin li cade û istasyonên Metro û cihên ji gel re vekirî hîcaba xwe ji serê xwe derdixin û digerin, li dijî qûrala hîcaba bi zorê ya Komara Îslamî ya Îranê derdikevin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-Irane-li-diji-qedexeya-hicaba-bi-zore-meydane-dixwinin-38442

Çavkanî:JINHA



## [Helbestvana Tûnisî Rîm El-Îsawî: Divê tabûyên civakî bên hilweşandin](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/helbestvana-tunisi-rim-el-Isawi-dive-tabuyen-civaki-ben-hilwesandin-38441)

Nivîskar, helbestvan û rexnegir Rîm El-Îsawî a dibêje "Dema ku em wext baş bikarbînin dikarin xeyalên xwe pêkbînin" diyar kir ku divê tabûyên civakî bên hilweşandin û di berhemên xwe de balê dikişîne ser pirsgirêkên jinan.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/helbestvana-tunisi-rim-el-Isawi-dive-tabuyen-civaki-ben-hilwesandin-38441

Çavkanî:JINHA



## [Li Afganistanê dibistanên xwendekarên keç hatin girtin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-afganistane-dibistanen-xwendekaren-kec-hatin-girtin-38443)

Li Afganistanê xwendina xwendekarên keç piştî pola 6'an ji aliyê Talîbanê ve hat qedexekirin, dibistanên ku STK piştgirî dide wan û berdewam dikin bi biryarek ji nişkave hatin girtin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-afganistane-dibistanen-xwendekaren-kec-hatin-girtin-38443

Çavkanî:JINHA



## ‘Enfal mijareke neteweyî ye divê tu carî neyê jibîrkirin’

Enfal ji bo gelê Kurd êşek neyê jibîrkirin e, jinên enfalê vê êşê du qat dijîn. Parlamentera serbixwe ya parlamentoya herêma Kurdistanê Şadî Newzad dibêje ku hikumet projeyên zagonî bi cih nakin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/enfal-mijareke-neteweyi-ye-dive-tu-cari-neye-jibirkirin-38440

Çavkanî:JINHA



## li Bûkanê nexweşxane bi xwendekarên jehrîketî tije bûye

Piştî êrîşa bi gaza jehrî ya li ser 5 dibistanên jinan ên li bajarê Bûkan ê Îranê, gelek xwendekar rakirin nexweşxaneyê. Xebatkarên tenduristiyê û rêveberên dibistanan jî ji bo bedêng bibînin di bin zextek giran de ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-bukane-nexwesxane-tije-xwendekaren-jehriketi-ne-38439

Çavkanî:JINHA



# Muayeneya bi kelebçe li ser hat ferzkirin

Rojnameger Ceylan Şahînli ku rastî zexta muayeneya bi kelebçe hat, der barê bijîşka mafê wê yê dermankirinê binpê kir de serî li Serdozgeriya Komarê ya Sîncanê û Wezareta Dadê û TTB û ÎHD'ê da.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/muayeneya-bi-kelebce-li-ser-hat-ferzkirin-38444

Çavkanî:JINGA



# Komeleya Dema Jinê rapora xwe aşkera kir

STENBOL - Komeleya Dema Jinê rapora xwe ya 6 mehan aşkera kir û got: "Qanûna 6284'an nehat sêpandin û ji ber vê jî gelek jinên ku bi şîdetê re rûbirû mayî ji neçariyê vegeriyan li malên xwe."

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/209104

Çavkanî:JINNEWS



## Li Ayşe Gokkan 3 sal û 9 meh ceza hat birîn

AMED - Li Berdevka TJA'yê Ayşe Gokkan bi hinceta "Konê Çareseriyê" yê di sala 2011'an de hatiye vekirin 3 sal û 9 meh cezayê girtîgehê hat birîn.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/209146

Çavkanî:JINNEWS



## Festîvala Filman a Kurt û Kurmancî diyarî Jîna, Evîn û Garîbe tê kirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Festîvala Filman a Kurt û Kurmancî îsal bi dirûşma “Jin jiyan azadî" bê lidarxistin û xelatên îsal dê li ser navê Jîna Amînî, Evîn Goyî û Garîbe Gezer werin dayîn.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/209147

Çavkanî:JINNEWS



## Saziyên jinan bi rêxistinbûna li kolanan ji bo civaka sivîl dibin model

Li qahîreyê tevî gelek zehmetiyan, saziyên jinan ji bo çareserkirina pirsgirêkan, gelek proje û bernameyan li dar dixin. Sazî, bi xebatên xwe yên rêxistinbûna li kolanan ji bo rêxistinên civaka sivîl dibin model.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/saziyen-jinan-bi-rexistinbuna-li-kolanan-ji-bo-civaka-sivil-dibin-model-38456

Çavkanî:JINHA



## Li Diyalayê jinek hat qetilkirin

Di êrîşek çekdarî ya dijî malek li navenda Diyalayê de jinek hat qetilkirin û hevjinê wê jî birîndar bû.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-diyalaye-jinek-hat-qetilkirin-38454

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Afganî li dijî Talîbanê ne: Li piştî vê şeva tarî ronahî heye](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-afgani-li-diji-talibane-ne-li-pist-ve-seva-tari-ronahi-heye-38453)

E'zem Qenberî diyar kir ku tevî endamên Talîbanê hatine cihê karê wê û bi gotin û awirên xwe gef lê xwarine jî, karê xwe berdewam dike û ji jinan re vê peyamê da: "Berdewam bikin û pêbawer bin ku li pişt vê şeva tarî ronahî heye."

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-afgani-li-diji-talibane-ne-li-pist-ve-seva-tari-ronahi-heye-38453

Çavkanî:JINHA



# Jinên Efganî li dijî Talîbanê banga yekîtiyê kirin

Tevgera Xweser a Jinên Têkoşerên Efganî bang li partiyên siyasî û rêxistinên sivîl kir ku li dijî polîtîkayên zextê yên Talîbanê bibin yek.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-efgani-li-diji-talibane-banga-yekitiye-kirin-38451

Çavkanî:JINHA



## Bi pirtûkên xwe yên çîrokan pirsgirêkên jinan ronî dike

Nivîskara pirtûkên çîrokan Raşa Farahat jî diyar kir ku ew bi çîrokên xwe hewl dide pirsgirêkên jinan ronî bike û her wiha xwest çîrokên wê ji bo zimanên din jî bên wergerandin. Nivîskar her wiha parve kir ku ew amadekariya pirtûkeke nû ya çîrokan dike.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/bi-pirtuken-xwe-yen-cirokan-pirsgireken-jinan-roni-dike-38449

Çavkanî:JINHA



## Ji bo lîstîkvan Hazal Kaya ceza hat xwestin

NAVENDA NÛÇEYAN - Derheqê lîstikvan Hazal Kaya de bi îdiaya “heqaret” li faîlê tecawizê Mûsa Orhan kiriye îdianame hate amadekirin û ji bo Hazalê 2 sal û 4 meh cezayê hefsê hate xwestin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/209156

Çavkanî:JINNEWS



# Fahriye Ceylan a ku 30 sal in girtî dîsa nehat berdan!

Fahriye Ceylan a li Girtîgeha Tîpa L a Alanyayê 30 sal in girtî ye wekî gelek girtiyan înfaza wê jî bi heman hincetan hat şewitandin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/fahriye-ceylan-a-ku-30-sal-in-girti-disa-nehat-berdan-38462

Çavkanî:JINHA



# Jinên Mamurekî li dijî xirbeyan nobetê digrin

Li Mamurekî jinan bertek nîşanî xirbeyên ku piştî erdhejê dirijînin nava taxên Elewiyan û diyar kirin ku axa wan ji ber vê yekê qirêj bûye dê berhem jê çênebin û gotin: “Cihekî ku em lê bijîn nehiştin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-mamureki-li-diji-xirbeyan-nobete-digrin-38465

Çavkanî:JINHA



## Nûnertiya siyasî ya jinan wekheviyê bi xwe re tîne

Bi projeya xurtkirina jinan di warê siyasî de, armanc ew e ku bi riya xurtkirina wan di warê zagonî de ji bo wekheviyê beşdarbûna siyasî ya jinan di nava meclisên hilbijêr de pêk bîne.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/nunertiya-siyasi-ya-jinan-wekheviye-bi-xwe-re-tine-38466

Çavkanî:JINHA



## Li Akrê jineke ciwan bi guman jiyana xwe ji dest da

Şeva borî li gundê Bedirîkê yê bajarokê Akrê jineke ciwan bi guman jiyana xwe ji dest da û kesûkarek wê got ku xwe şewitandiye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-akre-jineke-ciwan-bi-guman-jiyana-xwe-ji-dest-da-38474

Çavkanî:JINHA



# Nûçeyên Herêmî

## Li Idlibê jin ji neçarî tiştên mala xwe difroşin

Li Îdlibê ku di bin venêrîna Heyet Tehrir El-Şam de ye ji ber xirabûna rewşa aborî, rewşa jiyanê gelek nexweş bûye, jin ji bo pêwîstiyên xwe pêk bînin neçar dimînin tiştên malên xwe difiroşin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/li-idlibe-jin-ji-necari-tisten-mala-xwe-difrosin-38417

Çavkanî:JINHA



## Yaza Jasêm hunera 'Deq' digihîne nifşên pêşerojê

Yaza Jasêm ku tevî temenê xwe yê heftê salî, bi biryar e ku hunera "Deq"ê bigihîne nifşên pêşerojê, bang li hemû jinan dike ku "çand û kevneşopiyên xwe biparêzin".

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/yaza-jasem-hunera-deq-digihine-nifsen-peseroje-38425

Çavkanî:JINHA



## [Xaliya Ehmed kombûna çandî ya jinan tîne ser ekranê](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/xaliya-ehmed-kombuna-candi-ya-jinan-tine-ser-ekrane-38435)

Xaliya Ehmed ku piştî Şoreşa Rojava di gelek xebatan de cih girt, bi weşana radyo û televizyonê kombûna çandî ya jinan dide xuyakirin

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/xaliya-ehmed-kombuna-candi-ya-jinan-tine-ser-ekrane-38435

Çavkanî:JINHA



## [Jin li Minbicê di kampa koçberan de beşdarî rêveberiyê dibin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-minbice-di-kampa-kocberan-de-besdari-reveberiye-dibin-38461)

Jinên li Kampa Rojhilat a Nû ya bajarê Minbicê dimînin, bi di komînan de serkeftinên girîng bi dest dixin. Jinên ku li aliyekî pirsgirêkên jinan û gel çareser dikin, wiha dibêjin: "Em di guhertina feraseta mêr de bi israr in.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-minbice-di-kampa-kocberan-de-besdari-reveberiye-dibin-38461

Çavkanî:JINHA



## Li kampên Idlibê tu derfet ji bo jinên bi hemle tune ne

Jinên ducanî yên ku di kampên penaberiyê de li Idlibê şert û mercên dijwar de dijîn ji ber tunebûna xizmet, xurek û ava paqij, her wiha navendên tendirustiyê gelek zehmetiyan dikşînin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-kampen-idlibe-tu-derfet-ji-bo-jinen-bi-hemle-tune-ne-38468

Çavkanî:JINHA



**Kongra Star**

**21/4/2023**